

## KADİM HİKMET DERGİSİ

Uluslararası Sosyal Bilimler Dergisi



Kadim Hikmet, 6 (2022), 62-81

Araştırma Makalesi/Research Article

**Yayın Süreci:**

Geliş/Received: 20.05.2022

Kabul/Accepted: 30.05.2022

### BIKARANÎNA ‘ERÛZÊ Û HIN PIRSGRÊKÊN ‘ERÛZÊ: MÎNAKA SİWADÎ

Doç. Dr. Hacı Önen  
Dicle Üniversitesi-İlahiyat Fakültesi  
<https://orcid.org/0000-0001-9528-0209>  
hacionen@gmail.com

#### **Kurte**

‘Erûz, pîvana weznê ye ku di edebiyata klasîk de tê bikaranîn û rîtma helbestê nişan dide. Ji ber ku ‘erûz yek ji unsurên esasî yên helbesta klasîk e, di edebiyata klasîk de cihekî muhîm digire. Lê wexta helbestên klasîk ên Kurdî tîn latînzekirin hin pirsgrêk derdikevên holê. Di vê xebatê de em ê hem usûla tesbîtkirina erûzê û hem jî hin pirsgrêkên ku girêdayî erûzê ne binirxînin. Vê mijarê em ê bi mînaka berhema Siwadî ya Leyla û Mecnûn binirxînin. Em ê destxeta vê berhemê û latînzîza wê bidin berhev.

**Kelîmeyên Sereke:** ‘Erûz, Wezn, Klasîk, Edebiyat, Kurdî.

### ARÛZUN KULLANIMI VE ARÛZ İLE İLGİLİ BAZI PROBLEMLER: SİWADÎ ÖRNEĞİ

#### **Özet**

Arûz, klasik edebiyatta kullanılan ve şiirin ahengini sağlayan bir vezin ölçüsüdür. Arûz, klasik şiirin esas unsurlarından biri olduğu için klasik edebiyatta önemli bir yer tutar. Kürtçe klasik şiirler latinize edilirken, arûzla ilgili bazı sorunlarla karşılaşmaktadır. Bu çalışmada hem arûz vezinlerini tespit etme usûlünü ele almaya hem de bu konudaki bazı problemleri tartışmaya çalışacağız. Bu konuyu ele alırken Siwadî'nin Leyla û Mecnun adlı eserinin el yazmasını, latinize edilmiş haliyle karşılaştırarak incelemeye çalışacağız.

**Anahtar Kelimeler:** Arûz, Vezin, Klasik, Edebiyat, Kürtçe.

## USE OF ARUZ AND SOME PROBLEMS SIWADÎ AS AN EXAMPLE

### Abstract

Aruz is a measure of meter used in classical literature and provides the harmony of poetry. Since Aruz is one of the main elements of classical poetry, it has an important place in classical literature. While Kurdish classical poems are latinized, some problems related to prosody are encountered. In this study, we will try both to determine the prosody meter and to deal with some problems in this subject. In dealing with this issue, we will try to examine the manuscript of Siwadi's *Leyla u Mecnun* by comparing it with its latinised form.

**Key words:** Aruz, Vezin, Classical, Literature, Kurdish.

### DESTPÊK

Helbest bi rîtm û ahangê tê nivîsandin. Di helbestan da rîtm yan bi kêşa hêceyê yan jî bi kêşa ‘erûzê tê holê. Helbest di edebîyata modern de bi terzeke serbest tê nivîsandin.<sup>1</sup> Em dikarin bibêjin ku di helbestên modern de wezn ne giring e.

Di helbestên her milletî de ji bo rîtma dengan hin rê û rêbaz hene. Di helbestên Kurdî yên klasik de ji bo rîtmê jî ‘erûz hatiye bikaranîn. ‘Erûz, di edebiyata klasîk de mijareke muhîm e. Lewra di edebiyata klasîk de helbesvanan berhemên xwe bi e’ruzê nivîsandine. Di e’ruzê de heceyên kurt û dirêj li gor sîstemeke tîn bikaranîn. E’ruz rîtma dengan tîne holê. ‘Erûz, sîstema helbestê ye ku bi saya hêceyên kurt û dirêj di helbestan da ahenk tê holê.”<sup>2</sup>

Kêşa e’ruzê cara e’wil di edebîyata ‘Erebî de hatiye bikaranîn. ‘Erûz piştî qernê 8’an li gelek deweran hatiye bikaranîn. ‘Erûz li derdora Îranê, Efxanîstanê, Asyaya navîn û Hîndîstanê belav buye.<sup>3</sup> “Piştî ku Kurd û Faris bi hev ra Misilman bûne, kêşa ‘erûzê derbasî edebiyata Kurdî yû Farisî bûye.”<sup>4</sup>

<sup>1</sup> Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî Ya Klasîk* (İstanbul: Weşanên Nûbiharê, 2015), 365.

<sup>2</sup> Huseyin Tural, *Arap Edebiyatında Aruz* (İstanbul: Ensar Yayınları, 2011), 18.

<sup>3</sup> Haluk İpekten, *Eski Türk Edebiyatı: Nazım Şekilleri ve Aruz* (İstanbul: Dergah Yayınları, 2017), 131.

<sup>4</sup> Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî Ya Klasîk*, 367.

## A-‘ERÛZ DI TARÎXÊ DE

### 1-‘Erûz Di Tarîxa ‘Ereban da

Helbest di çanda ‘Ereban da cîhekî giring digre. Lewra ‘Ereban berî ku bibin misliman jî ehemiyetê didan helbestan. ‘Ereban ji bo lêkolîna helbestan du zanîst ava kirine. Yek ji wan îlmû’l-‘erûzê ye e, ya din jî îlmû’l-qafîye ye.<sup>5</sup>

Kêşa ‘erûzê cara pêşî di edebiyata ‘Erebî ya berî Îslamê ya “dewra cahiliyeyê” de hatiye tetbîqkirin. Vê serdema berî Îslamê teqrîben bi qasî 150 salan dewam kiriye. Di vê serdemê de helbesvanên wek Îmru1-Qeys, Zuheyr, Lebîd, E’ntere û hwd helbestên xwe bi ‘erûzê nivîsandine.<sup>6</sup>

Piştî ku ‘Ereb bûn misliman jî îlmê ‘erûzê di helbestan da hat bikaranîn. Xelîl b. Ehmed el-Ferahîdî (w. 175/791) cara yekemîn îlmê ‘erûzê tedwîn kiriye. Navê kîtaba Ferahîdî Kitabu’l-‘Erûz e û îro ev kîtab li ber destê me tune. Nivîskar di vê kîtaba xwe de îlmê ‘erûzê tedwîn kiriye û sistemetîze kiriye.<sup>7</sup>

Her çiqas berî Ferahîdî ‘Ereban kêşa e’rîzê di helbestên xwe de tetbîq kiribin jî têgehên vê zanîstê nehatibûn binavkirin. Ferahîdî ahengên helbestên berî xwe kategorîze kir û ji her kategoriyeke re navek danî û qalibên wan kategoriyan kifş kir. Li gorî dabeşkirina Ferahîdî di helbestên ‘Erebî de 16 behr/kategorî hene.<sup>8</sup>

Xelîl b. Ehmed el-Ferahîdî, li gor rîwayetên meşhûr, li gor teqwîma hicrî piştî nivê qernê II’yan de îlmê ‘erûzê derxistiye holê. Berî vê tarîxê, helbestvanên ‘Ereban, li gor helbestvanên berê, helbestên xwe rast dikirin û dinivîsandin. Ferahîdî, istîlahên ‘erûzê tesbît û terîf kiriye.<sup>9</sup> Ehmed el-Ferahîdî (w.791.), îlmê ‘erûzê li gor hin esasan tesbît kiriye.<sup>10</sup>

Exfeş el-Ewset (w. 215/830) jî li ser ‘erûzê berhemek nivîsandîye. Navê kîtaba Exfeş Kîtabu’l-‘Erûz e. Exfeş, ji bo ‘erûzê bihîstinê esas girtiye.<sup>11</sup> Exfeş, behrek li ‘erûzê zêde kiriye û hijmara behran kiriye 16 behr.<sup>12</sup> Exfeş ji bo erûzê sistemek ava kiriye. Lê ji Exfeş hew behra mutedarîk hatiye qebûl kirin.<sup>13</sup>

<sup>5</sup> İpekten, *Eski Turk Edebiyatı*, 132.

<sup>6</sup> Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî Ya Klasîk*, 367.

<sup>7</sup> Tefvîk Ruştu Topuzoğlu, “Halîl b. Ahmed”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, ts. (Erişim 22 Aralık 2021).

<sup>8</sup> Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî Ya Klasîk*, 367.

<sup>9</sup> Tural, *Arap Edebiyatında Aruz*, 19.

<sup>10</sup> M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi: Biçim-Ölçü-Kafiye* (İstanbul: Gökkuşbu Yayınları, 2011), 202.

<sup>11</sup> Ebu’l-Hasen Saîd b. Mes’ade el-Mucaşî’î el-Belhî el-Ahfeş el-Evsat, *Kitabu’l-‘erûz*, ts., 13.

<sup>12</sup> Hayruddîn ez-Zirikli, *el-A’lam Kamusu Teracime li-Eşherî’r-Rical ve’n-Nisa mine’l-‘Arab ve’l-Musta’ribîn ve’l-Musteşrikîn*, (Beyrût: Daru’l-İlmi’l-Malayîn, 2002), 3: 102.

<sup>13</sup> İpekten, *Eski Turk Edebiyatı*, 132.

## 2-‘Erûz Di Tarîxa Kurd û Farisan Da

Her çiqas berê ‘Ereban ‘erûzê bikar anîbin jî ‘erûz derbasî nav gelên din jî bûye. Piştî qernê 8’an de ‘erûz di nav gelên ku bûne misliman, belav bûye. Erûz berê derbasî edebiyata Farisan bûye. Di qernê 10’an de ‘erûz derbasî edebiyata Tirkan jî bûye.<sup>14</sup>

Piştî ku Kurd û Faris bi hev ra bûne misilman, ‘erûz derbasî edebiyata wan bûye. Bikaranîna Kurdan a kêşa e’ruze di wexteke zû de ye. Mesela Baba Tahirê Uryan dubeytiyên xwe di qernên 10’an de bi kêşa ‘erûzê nivîsandiye. Piştî ‘erûz bi rêya edebiyata Farisan derbasî edebiyata Tirkan bûye.<sup>15</sup>

Bi qasî ku tê zanîn di nav Kurdan da cara pêşî Ehmedê Xanî bi awayekî teorîk li ser zanîsta ‘erûzê rawestiyaye. Xanî di berhema xwe ya bi navê “Nûbihara Biçûkan” cih daye qalibên ‘erûzê û xwestiye ku zarokan fêrî vê kêşê bike.<sup>16</sup>

Kêşa ‘erûzê ji bo zimanê Kurdî minasîb e. Ji ber ku di zimanê Kurdî de heceyên kurt û dirêj hene, ‘erûz bi rehetî di nav Kurdan de hatiye bikaranîn. Di nav tarîxê de bikaranîna ‘erûzê pêş ketiye.

## B-MANEYA ‘ERÛZÊ

Peyva ‘erûzê, ji koka (عرض) (e-re-de) yê hatiye dariştin. Ev peyv jî bi maneya biçûkbûnê û pîrbûnê tê.<sup>17</sup> Maneyên peyva ‘erûzê gelek in. Hin maneyên ‘erûzê evin: Cîhet, hêl, Yemen, Mekke, Medîne, mekan, herem, dîreka nava çadirê û mînak.<sup>18</sup>

Her çiqas maneyên ‘erûzê pir bin jî ji bo erûzê du mane di pêş de ne. Erûz bi maneya dîreka nava çadirê tê bikaranîn û bi maneya mînakê tê bikaranîn. Mînak jî bi maneya weznê tê bikaranîn.

‘Erûz dîraka nava çadêre ye. Li gor hin nêrînan di nezmê de jî erûz ji bo helbestê lazim e û beyt bi xêra erûzê kare li ser pîya bimîne. Loma wezna helbestê bi navê erûzê bi nav bûye. Li gor nêrînek din Ferahîdî erûzê damezrandiye. Ferahîdî li Mekkeyê bû û navê Mekkeyê ‘erûz bû. Loma navê vê îlmê bûye ‘erûz.<sup>19</sup> Ligor nêrineke din ji ber ku helbest bi pîvana e’ruzî tê nivîsandin, ji vê îlmê re hatiye gotin ‘eruz.<sup>20</sup>

<sup>14</sup> İpekten, *Eski Türk Edebiyatı*, 131.

<sup>15</sup> Adak, *Destpêka Edebiyatê Kurdî Ya Klasîk*, 367.

<sup>16</sup> Adak, *Destpêka Edebiyatê Kurdî Ya Klasîk*, 367.

<sup>17</sup> Cemaluddin Muhammed b. Mukerrem İbn Manzûr, *Lisanu’l-‘Arab* (Beyrut: Daru’l-Kutubi’l-İlmiyye, ts.), 4: 600.

<sup>18</sup> İbn Manzûr, *Lisanu’l-‘Arab*, 4: 606, 607.

<sup>19</sup> Saraç, *Klasik edebiyat bilgisi*, 202.

<sup>20</sup> Zuheyr Ğazi Zahid, *Buhus fi Luġeti’s-Şi’r ve U’rudihî* (Beyrût: A’lamu’l-Kutub, 2001), 73.

Wezn (kêşe), ew pîvan e ku helbestek yan jî nezmek ji serî heta dawiyê li gorî wê pîvanê tê nivîsandin.<sup>21</sup> ‘Erûz ew pîvan e ku helbestên baş û rast ji ên xerab vediqetîne.<sup>22</sup> “Erûz ew îlmek e ku mirov ji bo hînbûna weznên helbestan, rastî û xeletîya weznan û zihaf û îletên weznan vê îlmê bikar tîne.”<sup>23</sup>

### C-QALIBÊN ‘ERÛZÊ Û TEF’ÎLE

Di helbestên klasîk de her misrayet li gor qalibeke erûzê tê nivîsandin. Ev qalib ji sê yan jî jî çar parçeyan (cuzan) pêk tê. Tef’île, parçeyên qalibên ‘erûzê ne. Ji bo wezna helbestan 8 tef’ileyên sereke hene ku wezn ji van tefileyên pêk tê.

Tef’ileyên esas ev in:

1-fe’ûlun (. \_ \_)

2-fa’îlun ( \_ . \_)

3-fa’îlatun ( \_ . \_ \_)

4-mefa’îlun ( . \_ . \_)

5-mustef’îlun ( \_ \_ . \_)

6-mef’ûlatu ( \_ \_ \_ .)

7-mufa’eletun ( . \_ . .)

8-mutefa’îlun ( . . \_ .)

Van 8 te’ileyên esas dugêrin û hin qalibên nû ji wan çêdibin. Bi bikaranîna van te’ileyên 16 behrên meydanê. Ji bo her behrê, behra salîm û ne salîm heye.<sup>24</sup>

Behrên salîm ev in:

1-Behra Tewîlê (Dirêj):

Fe’ûlun – mefa’îlun – fe’ûlun – mefa’îlun

2-Behra Medîdê (Dirêj kîrî):

Fa’îlatun – fa’îlun – fa’îlatun – fa’îlun

<sup>21</sup> Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî Ya Klasîk*, 365.

<sup>22</sup> Saraç, *Klasik edebiyat bilgisi*, 202.

<sup>23</sup> Tural, *Arap Edebiyatında Aruz*, 17.

<sup>24</sup> İpekten, *Eski Türk Edebiyatı*, 133.

3-Behra Basîte (Sade):

Mustef'ilun – fa'ilun – mustef'ilun – fa'ilun

4-Behra Wafîre (Pir):

Mufa'eletun – mufa'eletun – mufa'eletun

5-Behra Kamile (Tam) :

Mutefa'ilun - mutefa'ilun - mutefa'ilun

6-Behra Hezecê (Kilam gotin) :

Mefa'ilun –mefa'ilun- mefa'ilun –mefa'ilun

7-Behra Recezê (Lerizandî) :

Mustef'ilun - mustef'ilun

8-Behra Remelê (Bazdan) :

Fai'latun – fai'latun – fai'latun

9-Behra Serî'e (Zû)

Mufte'ilun – mufte'ilun – mef'ulatu

10-Behra Munserihê (Zûbûn)

Mustef'ilun – mef'ulatu - mustef'ilun

11-Behra Xefifê (Sivik)

Fa'ilatun – mustef'ilun – fa'ilatun

12-Behra Muzari'e (Şibandîn)

Mefa'ilun - fa'ilatun - mefa'ilun

13-Behra Muktedabê (Jêkiri)

Mef'ûlatu - mustef'ilun - mustef'ilun

14-Behra Muctesê (Jêkirî)

Mustef'îlun - fa'îlatun

15-Behra Mutekarîbê (Nêzîk)

Fe'ûlun - Fe'ûlun - Fe'ûlun - Fe'ûlun

16-Behra Mutedarîkê (Kesê di dawiyê de hatî)

Fa'îlatun - fa'îlatun - fa'îlatun - fa'îlatun

Van behranan ên salîm in û en ne salîm jî hene. 15 qalibên 'ewil ji hêla Ferahidî, hatiye çêkirin. Qaliba şazdemîn ji hêla Exfeş el-Ewset hatiye çêkirin.<sup>25</sup>

### **D-CÛREYÊN HÊCEYAN LI GOR 'ERÛZÊ**

'Erûz, di helbestan de sîstema ahengê ye. Di 'erûzê de hêceyên weznê li gor sîstemekê li pê hev tên û 'erûzê derdixin holê. Ji bo em karibin wezna 'erûzê fam bikin lazim e em zanibin ku kîjan hêce dirêjên yan jî kîjan hêce kurtin. Di 'erûzê de sê cureyên heceyan hene. Ev jî vana ne:

1-Hêceyên kurt (vekirî).

2-Hêceyên dirêj (girtî).

3-Hêceyên bi med (Hêce û niv tê hesêb).

#### **1-Hêceyên Kurt (Hêceyên Vekirî)**

Dawîya hêceyekê bi dengdêrekê kurt biqede, jê re tê gotin hêceya kurt. Ji hêceya kurt re tê gotin hêceya vekirî jî. Hêceya kurt, bi nixtikê tê nîşankirin.

Di Kurdî de van mînakên jêr hêceyên kurt in:

Dawîya hêceyê dengdêreke kurt be, hêce kurt tê hesibandin.

Mînak: Bike (. .), Were (. .)

Li gor 'Erebî, dengdêrên kurt bi herekeyan tên nîşandan. Di 'Erebî de sê hereke hene. Fethe (Zîber / Ser), dengê e'yê yan a'yê ya kurt dide herfê.

Mînak: (ف) fe - (ص) sa

Damme (Pêş / Ber), dengê û ya kurt dide herfê

<sup>25</sup> İpekten, *Eski Türk Edebiyatı*, 135.

Mînak: (ق) qû

Kesre (Zêr / Cir), dengê î ya kurt dide herfê.

Mînak: (م) mî

Li gor alfabeya Kurdî herfên kurt ev in: e, i, u.

## 2-Hêceyên Dirêj (Hêceyên Girtî)

Eger dawîya hêceyekê bi dengdêreke dirêj biqede, yan jî bi herfekî bêdeng biqede jê re tê gotin hêceya dirêj. Ji hêceya dirêj re tê gotin hêceya girtî jî. Hêceya dirêj bi sembola (-) tê nîşandan.

Di Kurdî de van mînakên jêr hêceyên dirêj in:

Dawîya hêceyê bi dengdêreke dirêj, yan jî bi herfeke bêdeng be, dirêj tê hesibandin.

Mînak: Zarok (- -), Hat (-), Ka (-)

Di ‘Erebî de sê herf hene ku deng bi wan dirêj dibin. Ev hef jî (elîf û vav û ya) ne.

Elîf piştî fetheyê tê û di ‘Erebî de hem dengê e’yê û hem dengê a’yê dide. Lê di Kurdî de hew dengê a’yê dide.

Mînak: (مار) mar , (كا) ka

Waw, piştî dammeyê tê û di ‘Erebî de hew dengê û’ya dirêj dide. Lê di Kurdî de hem dengê û’ya dirêj dide û hem jî dengê o’yê dide.

Mînak: (دور) dûr, (دور) dor.

Ya, piştî kesreyê tê û di ‘Erebî de hev dengê î’ya dirêj dide. Lê di Kurdî de hem dengê î’ya dirêj dide û hem jî dengê ê’yê dide.

Mînak: (شیر) şîr, (شیر) şêr.

Li gor alfabeya Kurdî herfên dirêj ev in: a, ê, î, û, o.

## 3-Hêceyên Bi Med

Med bi maneya dirêjkirinê ye. Di ‘erûzê de hinek hêce, du hêce tê qebûl kirin. Hêcaya pêşî dirêj, hêceya duyemîn kurt tèn qebûl kirin. Hêceyên bi med di qîmeta hêce û nîvek de ne. Ji hêceya bi med ra tê gotin îmaleya memdûde jî.

Mînak: Av, naz, îşq, derd.



Hêceyên bi med di qîmeta hêce û nîvek dene. Hêceya yekemin dirêj û ya duyemîn kurt tê hesêb. Hêceyên bi med bi vî hawî (- .) tî nîşandan.<sup>26</sup>

## E-RÊ Û RÊBAZ JI BO TETBÎQKIRINA ‘ERÛZÊ

Di bikaranîna erûzê de helbest her tim li wezna erûzê nayê. Ji bo helbestvan karibe kêşa erûzê li hev bîne hin rêbaz hatiye tesbit kirin. Ji bo bikaranîna erûzê wesl, med û îmale hatiye bikaranîn.

Helbesvanan ji bo helbestên wan li weznê were, carnan li ser deng hinek mu’ameleyan kirine. Bi vî hawî helbestên xwe xistine weznê. Em ê jî li ser van rêbazan rawestin.

### 1-Zîhaf

Eger di beytekê de hêceyê dirêj ji bo weznê kurt bê xwendin, wê demê zîhaf pêk tê. Zîhaf ji bo ku beytên helbestê li weznê were tê bikaranîn. Bi zîhafê du tişt tî kirin:

1-Hêceyê ku dirêj be, ji bo weznê kurt tê xwendin.

2-Hêceyê ku bi med be, kurt tê xwendin. Bi vî hawî hêceya bi med dikeve dewsa hêceyê dirêj.

Zîhaf ji bo helbestvan qusûr tê qebûl kirin. Di zîhafê de qalibê kelîmeyan tê guhertin. Ji ber vê jî esl û ahenga kelîmeyan bi zîhafê xerab dibe. Loma zîhaf ji bo helbestvan qisûrek mezin tê qebûl kirin.<sup>27</sup>

**Mînak:** Peyva leylî di erûzê de du hêceyên girtî ne. (- -) Em î’ya leylî kurt biwxînîn dibe leylî. Di erûzê de dibe du hêce (- .). Hêceyê girtî yû hêceyê vekirî ye.

### 2-Îmale (Îmale Ya Meqsûre)

Îmale bi ‘Erebî bi meneya dirêj kirinê ye. Hêceya ku lazim e kurt bê xwendin, eger dirêj bê xwendin ev dibe îmale.<sup>28</sup>

Bi îmalê dengdêrek kurt, dibe dirêj. Bi vî hawî hêceyê dirêj bi dest dikeve. Di kelîme ya (bike) yê de em karin i’yê û e’yê dirêj biwxînîn.

Îmale ji bo helbestvan qusûr hatiye qebûl kirin.<sup>29</sup> Hin nivîskaran îmaleyê di hin halan de wek wasiteya ahengê dîtine.<sup>30</sup> Lê îmale ji hêla helbesvanan wek qusûrek hatiye qebûl kirin. Helbestvanan heta îmkan hebe ji îmaleyê xwe dûr xistine.

<sup>26</sup> Saraç, *Klasik edebiyat bilgisi*, 2011, 212.

<sup>27</sup> İpekten, *Eski Turk Edebiyatı*, 157.

<sup>28</sup> İpekten, *Eski Turk Edebiyatı*, 146.

### 3-Med (Îmale Ya Memdûde)

Med, di ‘Erebî de bi maneya dirîşkirinê ye. Di ‘erûzê de hinek hêce, dirêj tê xwendin û ji wan re tê gotin med. Hêceyên bi med hêce û nîv tînen qebûl kirin. Hêcaya pêşî dirêj, hêceya duyemîn kurt tê qebûl kirin. Hêceyên bi med bi vî hawî (- . ) tînen nîşandan.

Hêceyên bi med li jêr hatine nivîsandin:

1-Hêceyên ji dengdêrek dirêj û ji herfek bêdeng pêk tînen: Av. Di Farisî de peyva ab (av)ê bi med hatiye xwendin. Em jî bi Kurdî karin vê peyvê bi med qebûl bikin.

2- Hêceyên ji herfekî bêdeng û ji dendêrekî dirêj û ji herfekî bêdeng pêk tînen: Naz

3- Hêceyên ji dendêrekî kurt û ji du herfên bêdeng pêk tînen: Işq

4- Hêceyên ji herfek bêdeng û ji dendêrek kurt û ji du herfên bêdeng pêk tînen: Derd

Wexta di nava kelîmeyên ‘‘Erebî û Farisî û Kurdî dengdêrên dirêj hebe bi med hatine xwendin. Hêceyên dirêj û hêceyên bi du herfên bêdeng diqedin û hêceyên bi hemzeyê diqedin bi medê tînen xwendin.<sup>31</sup>

Her çiqas hin kesan, medê di nav qusûrên helbestvan de hesibandibe jî, med ji bo helbestvan ne qusûr e. Hetta terka medê qusûr tê qebûl kirin. Lewra med ji bo ahenga helbestê tê bikaranîn û terka medê wek zîhaf hatiye qebûl kirin.<sup>32</sup> Mesela peyva nûrê bi med tê xwendin û du hêce tê qebûl kirin. Bi zîhafê bê xwendin hêceyek tê qebûl kirin.

Wexta ku hêceya bi med kurt bê xendin ev dibe zîhaf, zîhaf jî qusur tê qebûl kirin.<sup>33</sup> Di peyvên ‘Erebî û Farisî û Kurdî de med ne qusûr e. Lewra di van zîmanan da hêceyên dirêj hene. Lê di peyvên Tirkî de med qusûr hatiye qebûl kirin. Lewra di zîmanê Tirkî de peyvên bi med tune ne.<sup>34</sup>

### 4-Wesl

Wesl, gihaştina tiştêkî bi tiştêkî dinê ve ye. Wesl bi vî hawî çêdibe: Kelîmeyek ku bi herfek bêdeng diqeke bi kelîmeyek ku bi dengdêrekê diqede, bê zeliqandin wesl çêdibe. Wesl bi du hawî çêdibe:

<sup>29</sup> İpekten, *Eski Türk Edebiyatı*, 146.

<sup>30</sup> Saraç, *Klasik edebiyat bilgisi*, 211.

<sup>31</sup> İpekten, *Eski Türk Edebiyatı*, 151.

<sup>32</sup> İpekten, *Eski Türk Edebiyatı*, 151.

<sup>33</sup> Ahmet Doğan, *Açıklamalı ve Örnekli Aruz Bilgisi* (Ankara: Akçağ Yayınları, 2013), 19.

<sup>34</sup> Saraç, *Klasik edebiyat bilgisi*, 214.

1-Bi weslê hêceyek kurt tê bi dest xistin. Mînak: Hesen û Ehmed (. - - -) dibe hese nû ehmed (. . - -)

2- Bi weslê hêceyek bi med hinek kurt dibe. Hêceya bi med hinkî kurt dibe û dibe hêceyek dirêj. Mînak: nar û celal (- . . -) dibe na rû celal (- - . -)

Wesl ji bo helbestvan ne qusûr e. Wesl ji bo ritm û ahenga helbestan lazim e. Wexta wesl neyê bikaranîn sekt çêdibe. Lazim e helbestvan ji sektê dûr bisekine.<sup>35</sup>

### 5-Textfif

Ji bo wezna helbestê, peyvên ku bi ‘Erebî ne û bi şedde ne, bê şedde bê xwendin ji re tê gotin textfif. Hin peyvên ‘Erebî wextê derbasî Kurdî bûne bêşedde hatine xwendin. Wek peyva seyîdê. Eslê vê peyvê seyyîd e û li gor erûzê du hêceyên dirêj (- -) tê hesêb. Di Kurdî de seyîd tê xwendin û gora erûzê hêceyek kurt û hêceyek dirêj (. -) tê hesêb. Lê ev peyv ji bo weznê bi şedde jî em karin bixwînin.

### 6-Teşdîd

Teşdîd bi maneya şeddekirinê ye. Di şeddeyê de herf du cara dubare dibe. Ji bo wezna helbestê, peyvên ku bê şedde ne, bi şedde bê xwendin jê re tê gotin teşdîd. Em karin peyva seyîdê wek seyyîd bixwînin. Ev dibe teşdîd.

## F-QUSÛRÊN HELBESTVAN

Di ‘erûzê de hin mijar wek qusûrên helbestvan tên dîtin. Lê çî ji bo helbestvan qusûr tê qebûlkirin piranî ew ne diyar e. Lewra di vê mijarê de nîqaş hene.

Yek ji qûsûrên helbestvan zihaf e. Di zîhafê de qalibê kelîmeyan tê guhertin. Ji ber vê jî esl û ahenga kelîmeyan bi zîhafê xerab dibe. Loma zihaf qusûrek mezin ji bo helbestvan tê qebûlkirin.<sup>36</sup>

Îmale jî ji bo helbestvan qusûr hatiye qebûlkirin.<sup>37</sup> Hin nivîskaran îmaleyê di hin halan de wek wasiteya ahengê dîtine.<sup>38</sup> Lê îmale qasî zîhafê nebe jî disa jî qûsûr tê qebûlkirin.

Her çiqas hin nivîskaran medê di nav qûsûrên helbestvan de hesibandibe jî, med ji bo helbestvan ne qusûr e.<sup>39</sup> Hetta terka medê qusûr tê qebûlkirin. Lewra terka medê dibe zîhaf. Zîhaf jî qûsûrek giran e.

<sup>35</sup> İpekten, *Eski Turk Edebiyatı*, 143.

<sup>36</sup> İpekten, *Eski Turk Edebiyatı*, 157.

<sup>37</sup> İpekten, *Eski Turk Edebiyatı*, 146.

<sup>38</sup> Saraç, *Klasik edebiyat bilgisi*, 214.

Di peyvên ‘Erebî û Farisî û Kurdî de med qusûr nehatiye qebûlkin. Di peyvên Tirkî de med qusûr hatiye qebûlkin. Lewra di zimanê Tirkî de peyvên bi med tune ne.<sup>40</sup> Med pir caran ji hêla helbestvanan ve hatiye bikaranîn û terka medê wek zihaf hatiye qebûlkin.<sup>41</sup>

## G-LATÎNÎZEKIRIN Û HIN XELETIYÊN DI ERÛZÊ DE TÊN HOLÊ

### 1-Xwendin û Nivîsandina Herfa Î’yê

Di latînîzekirina helbestan da di xwendin û nivîsandina herfa î’yê hin xeletî çêdibin. Lewra î’ya Kurdî dirêje. Helbukî di ‘Erebî da ev herf caran dirêj caran jî kin tê xwendin. Î’ya dirêj di ‘Erebî de bi (ي) tê nivîsandin.

Harfa î’ya kurt ku ji ‘Erebî derbasî kurdî bûbe li hin heraman kurt li hin hereman dirêj tê xwendin. Wek peya îhsan hem ihsan u hem îhsan tê xwendin.<sup>42</sup>

Di nivîsandinê harfa î’yê piranî bi î’ya dirêj tê nivîsandin. Ev di latînezîkirina helbestan de dibe pirsgirêk. Ji bo vê pirsgirêkê mirov kare çareyekê wiha bibîne: Eger î’ya ‘Erebî wextê derbasî Kurdî bûbe, kurt hatibe xwendin mirov kare, vê kurt binivîsîne. Wek mînak peyva xizmetê mirov kare kurt binivîsîne. Eger di Kurdî de kurt nayê xwendin mirov kare bi î’ya dirêj binivîsîne. Lewra î’ya kurt di alfabeya Kurdî da tune. Le wexta helbestên klasîk tîne latîneze kirin mirov î’ya E’rabî ya kurt bi herfa î’yê binivîse ev ê çêtirbe. Bi vê hawî ewê bê fêmkirin ku harf î’ya kurte, ne dirêje.

### 2-Xwendin û Nivîsandina Herfa A’yê

Di latînîzekirina helbestan da di herfa a’ya ‘Erebî de pirsgirêk derdikeve. Lewra di Kurdî de herfa a’yê dirêj tê qebûlkin. Lê di hin kelîmeyên ji ‘Erebî derbasî Kurdî bûye a kurte.

Li hin hereman pevva sabirê, sebir tê xwendin, li hin hereman sabir tê xwendin. Di peyva sebrê de wexta hefa e’yê, a bê xwendin ew a’ya kurt e. Lazim e ku rast bê latinîze kirin. Wextê wezin tê tesbît kirin lazîm e a’ya kurt, kurt bê qebûlkin. Di ‘Erebî de a’ya dirêj bi elîfê tê nivîsandin.

<sup>39</sup> Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî Ya Klasîk*, 383.

<sup>40</sup> Saraç, *Klasik edebiyat bilgisi*, 214.

<sup>41</sup> İpekten, *Eski Turk Edebiyatı*, 151.

<sup>42</sup> Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî Ya Klasîk*, 378.

### **3- Xwendina Herfa Ú'yê**

Di zimanê Kurdî de telafuza ú'yê dirêj e. Lê di 'erûze de ú ya ku ji bo atifê tê bikaranîn hem dirêj hem jî kin tê hesibandin. Lewra di 'erûza Kurdî de ú'ya atifê hem dirêj hem jî kurt mirov kare bixwîne.

Mînak: Ehmed û Hesen

Di vê mînakê da di peyva ehmed û hesen de, di helbestan da ú hem dirêj hem jî kin tê qebûlkin.

### **4- Xwendina Herfa Ê'ya Îzafetê**

Di zimanê Kurdî de telafuza ê'yê dirêje. Di Erûzê de harfa ê'ya ku ji bo îzafetê tê bikaranîn hem dirêj hem jî kurt tê hesibandin. Lewra di 'erûza Kurdî de ê'ya îzafetê hem dirêj hem jî kurt mirov kare bixwîne.

Mînak: Nanê hesen

Di vê mînakê da di peyva nanê hesen de, di helbestan da ê hem dirêj hem jî kin tê qebûlkin.

### **4- Xwendin û Nîvîsandina Herfa 'Eynê**

Herfa eynê di herfên 'Erebî de heye. Lê di alfabeya Kurdî ya latînî de tune ye. Ji ber vê gerek em zanibin ku herfa eynê di 'erûzê de herfek dirêj e, ne kine. Lewra e'yn herfek bêdeng e. Ne herfek dengdêr e.

### **5-Tetbîqa Latinizekirinê û 'Erûz**

Latînîzekirina helbestên klasîk caran hin pirsgirêkan derdixe holê. Lewra pir caran wextê hin lêkolîner, helbestan latînîze dikin li pîvanên 'erûzê nanêrin. Ji ber ku di latînîzekirina helbestan de weznên 'erûzê nay bikaranîn hin helbest bi xeletî derbasî herfên latînî dibin. Em ê ji bo vê mijarê li ser hin mînanan rawestin.

Ji bo mînakê em ê li vê beyta Şêx Ehmedê Xanî binêrin:

Xanî ji kemalê bê kemalî

Meydana kemalê dît xalî

Wezna helbestê ev e:

Mef'ûlu – Mefa'ilûn – Fe'ûlun

Vê beyta jor di hinek nusxeyên Mem û Zînê de xelet hatiye nivîsandin û wezna beytê hatiye xerab kirin. Di nusxeya Nûbiharê ku bi herfên 'Erebî hatiye çap kirin peyva dîtê (ديت)

dîtî hatiye nivîsandin.<sup>43</sup> Di nusxeya Awesta yê de ku bi herfên latînî hatiye çap kirin peyva dîtê, dît hatiye nivîsandin.<sup>44</sup>

Wextê em li wezna vê beytê binêrin, em dibînin ku di peyva dîtî yê de î dirêj e. Helbûkî li gor weznê gerek kurt bê xwendin. Bi zîhafê em karin kurt bixwînin, lê zihaf qusûr e ji bo helbestvan. Helbûkî em vê peyvê bi med karin bixwînin. Bi vî hawî peyva dîtê dibe du hêce. Hêceyek dirêj e û yek jî kurt e. Dît bi vî hawî (- .) tê nîşandin.

Nivîsandin û latînîzekerina vê beytê di nusxeya awestayê de rast hatiye nivîsandin. Nusxeya din xelet hatiye nivîsandin. Dît, li jor bi vî hawî (- .) me nîşanda.

Wezna vê beytê wiha em karên nişan bidin:

Mef'ûlu – Mefa'ilûn – Fe'ûlun

( \_ . / . \_ . \_ / . \_ \_ )

Xanî ji kemalê bêkemaî

( \_ . / . \_ . \_ / . \_ \_ )

Meydana kemalê dît xalî

( \_ . / . \_ . \_ / . \_ \_ )

## H-HIN QAÎDE Û QALIBÊN 'ERÛZÊ

'Erûz pir caran ji bo xwendevan û lêkolîneran wek mijarekek pirsgrêk xuya dike. Lê ji bo fêmkirin u tesbîtkirina erûzê hin qaîde hene ku lazim e bê zanîn. Em ê li ser vê mîjarê rawestin.

Di 'erûzê de carnan qalibên 'erûzê diguhere. Di vê behra remelê de Fe'ilatun / Fe'ilatun / Fe'ilatun / Fe'ilun guherîn çêdibe. Di pêşiya misrayê de tef'îleya fe'ilatun dibe fa'ilatun. Tef'îleya dawiyê fe'ilun dibe fa'lun.

Qalibê weznê bi vî hawî ye:

Fe'ilatun / Fe'ilatun / Fe'ilatun / Fe'ilun

Ev wezn dikeve vî halî:

Fa'ilatun / Fe'ilatun / Fe'ilatun / Fa'lun

<sup>43</sup> Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn* (İstanbul: Weşanên Nûbiharê, 2009), 30.

<sup>44</sup> Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, ed. Kadri Yıldırım (İstanbul: Weşanên Avestayê), 157.

Vê qaîdeyê hew di vê qalibê de çêdibe. Bi vê guhertêne de ji bo helbestvan rehetî heye.<sup>45</sup>

Dîsa di behra remelê de guherîn çêdibe. Di qalibê Fai'latûn – fai'latun – fai'latun – Failin'ê û Fe'ilatun - Fe'ilatun - Fe'ilatun - Fe'ilun'ê de tefleya dawîn carnan bi şîklê fe'lun'ê tê.<sup>46</sup>

Carinan qaliba fe'ilatun - fe'ilatun – fe'ilun bi şîklê Fai'latun - fe'ilun- Fe'lun tê guhertin.<sup>47</sup>

Carinan di helbestan de sekta melîh çêdibe. Qaliba Mef'ulû – mefa'ilun – fe'ulun bi şîkli Mef'ulûn – fa'ilun – fe'ulun bê guhertin, ev dibe sekta melîh.<sup>48</sup> Sekta melîh bi maneya sekta xweşike.

Hin qalibên ku pir tê bikaranîn mirov kare bizanibe. Ev ji bo dîtina qaliban rehetiyek tîne holê. Hin qalibên ku di helbestan de pir tê bikaranin ev in:

Mefailun / Mefailun / Feûlun ( . . . ) ( . . . ) ( . . . )

Feilatun (Failatun) / Feilatun / Feilatun / Feilun (fa'lun) ( . . . ) ( . . . ) ( . . . ) ( . . . )

Failatun / Failatun / Failatun / Failun ( . . . . ) ( . . . . ) ( . . . . ) ( . . . )

Failatun / Failatun / Failun ( . . . . ) ( . . . . ) ( . . . )

Mufteilun / Mufteilun / Failun ( . . . . ) ( . . . . ) ( . . . )

Feûlun / Feûlun / Feûlun / Feûl ( . . . ) ( . . . ) ( . . . ) ( . . )

Mefailun / Feûlun / Mefailun / Feûlun ( . . . . ) ( . . . ) ( . . . . ) ( . . . )

Feilatun (Failatun) / Mefailun / Feilun (Fa'lun) ( . . . . ) ( . . . . ) ( . . . )

Fa'lun / Feûlun / Fa'lun / Feûlun ( . . ) ( . . . ) ( . . ) ( . . . )

Mef'ûlu / Failatu / Mefaîlu / Failun ( . . . ) ( . . . . ) ( . . . . ) ( . . . )

Mef'ûlu / Mefaîlun / Feûlun ( . . . ) ( . . . . ) ( . . . )

Mef'ûlu / Mefaîlu / Mefaîlu / Feûlun ( . . . ) ( . . . . ) ( . . . . ) ( . . . )

Mef'ûlu / Mefaîlun / Mef'ûlu / Feûlun ( . . . ) ( . . . . ) ( . . . . ) ( . . . )

<sup>45</sup> Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî Ya Klasîk*, 284; İpekten, *Eski Turk Edebiyatı*, 238.

<sup>46</sup> Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî Ya Klasîk*, 384.

<sup>47</sup> İpekten, *Eski Turk Edebiyatı*, 246.

<sup>48</sup> Saraç, *Klasik edebiyat bilgisi*, 218.

Mef'ûlu / Mefaîlu / Feûlun ( - - . ) ( . - - . ) ( . - - )

Mufte'îlun / Failun / Mufte'îlun / Failun ( - . . - ) ( - . - ) ( - . . - ) ( - . . - )

Mefailun / Feilatun / Mefailun / Feilun (Fa'lun) ( . - . - ) ( . - - ) ( . - . - ) ( . . )

Pîştî hêceyên helbestan hat tesbît kirin, mirov kare hêceyan bi van qaliban tesbît bike. Ev qalib ji bo lêkolîneran dibe alikar.

## **I-LEYLA Û MECNUN JI HÊLA 'ERÛZÊ**

### **1-Qaîdeyên Tesbîtkirina Weznên 'erûzê**

Em ê di vê beşê de li ser kitaba Leyla û Mecnûnê rawestin. Lê berê lazim e em liser tetbîqkirina 'erûzê rawestin. Ji bo tesbîtkirina weznan lazim e hin qaîde bê zanin. Lewra bi sirayê lazim e qaîdeyên li jêr bê tetbîpkirin.

1-Berê misra tê nivîsandin. Hêceyên dirêj gerek li ber çavan bin.

2-Hêceyên kurt û dirêj tînen tesbîtkin.

3-Hêceyên bi med gerek bînen tesbîtkin. Lewra hijmara hêceyan carnan li hev nayên.

4-Hêceyan gerek mirov bide ber hev. Berê mîrov li weslê ew jî tune be li îmaleyê dinêre. Herî dawî mîrov li zîhafê dinêre.

5-Mîrov li hêceyên kurt û dirêj dinêre. Li gor hijmara misrayan tefîleyan texmin dike. Tefîleyên herî kurt di dawîya misrayan de tînen.

6-Îşaret û qalib gerek li hev werin.

### **1-Xeletiyên Latînezekîrîna Leyla û Mecnûnê û Tetbîqa E'ruzê**

Em ê di vê beşê de li ser kitaba Leyla û Mecnûnê rawestin. Ev kîtap hatiye latînezekirin. Nusxeya latînzê û destnivîsa vê em ê muqayese bikin. Di latînezekirinê de gelek xeletî hatine kirin. Lewra di vê nusxeyê de li 'erûzê nehatiye nêrîn. Ji ber vê wexta ku kîtap hatiye latînezekirin, wezna helbestê xerab bûye. Em ê tehlîla 'erûzê jî bikin. Em ê li ser deh beytên ku di serê berhemê dene, rawestin.

Wezna kîtabê ev e:

Mef'ûlu - mefa'îlun - fe'ûlun

Latînezekirina kîtabê me bi vî hawî kiriye:



1.

Fehrîst e Kitabê navê me'bûd

Qeyyûm û qedîm û heyî û mewcûd

( - - . / . - - - / . - - )

Di misraya yekemînde di kelîmaya “navê” de hêceya duyemîn lazime bi zîhafê bê xwendin. Di misraya duyemînde peyva û'yê lazim e bi zihafê bê xwendin. Yan jî em karin bêjin ku herfa ê'ya îzafetê û û'ya atifeyê hem kurt hem dirêj tê xwendin.

2.

Bê şîbh û misal û edl û xalîq

Sazende ê mumkinat û faîq

Di herdu misrayande û'ya atîfe kurt hatiye hesibandin. Em karin vana kurt qebûl bikin.

3.

Bê ewwel û axîr û ezîm î

Wehhab û Kerîm û hem rehîm î

Di misraya yekemînde di peyva “ewwel û” bi wesl hatiye xwendin.

4.

Mewcûd kirin te hinde me'lûm

Mewcûd tu yî hemî di me'dum

Di herdu hêceyan de hêceyek kême xuya dike. Lê wexta em bala xwe bidinê em dibînin ku hêceyek bi med e. Di herdu misreyan de peyva muvcûdê bi med e. Hêceya duyemîn cûd bi med bê xwendin dibe hêce yû niv û bi vî hawî tê nîşandan: ( - . ) Peyva mewcudê muqabilî tefî'leya mef'ulu tê.

Ev beyt di nûsxeya nubiharê de wiha hatiye latînezekirin:

Mewcûd î kirin te hinde me'lûm

Mewcûd î tu yî hemî di me'dum<sup>49</sup>

<sup>49</sup> Siwadî, *Leyla û Mecnûn*, çev. M. Reşit Irgat (İstanbul: Weşanên Nûbiharê, 1999), 11.

Di herdu misrayande hêceya î'yê hatiye zêdekirin. Di dest nîvîsê de ev hêce tune. Lê nivîskar ji ber ku li 'erûzê neneriye, zan kiriye ku hêceyek kême. Helbukî hêce kême nînin. Ji ber ku î li helbestê hatiye zêdekirin rîtme helbestê xerab bûye.

5.

Eşya te hemî kirin musenna

Wahîd bi xu ye Ferîd û Yekta

Di misraya duyemîn de hêceyên "ye" û "fe"yê lazim e dirêj bûya. Helbestvan li vir îmale kiriye. Dîsa helbestvan û'ya atîfeyê kurt xwendiyê.

6.

Bê yumn û yesar û bê mekan î

Bê teref û cîhet û bê nîşanî

Di misraya yekemîn de helbestvan û'ya atîfeyê hem dirêj hem ji kurt xwendiyê. Di misraya duyemîn de helbestvan di peyva "teref û"yê de tu tîşt kiriye: hêceya te'yê bi îmale xwendiyê. Herfa f'yê bi wesl xwendiyê. Lewra lazîme hêceya ref'ê kurt bê xwendin. Hêceya bê'yê bi zîhaf hatiye xwendin.

7.

Xalî ered û cism û cewahir

Bê alet û Qeys û cumle çêkir

Di misraya yekemîn de "ered û" bi wesl hatiye xwendin. Di misraya duyemîn de "alet û" bi wesl hatiye xwendin. Di nusxeya nûbiharê de hin hêce di misraya yekemîn de hatiye zêdekirin. Ev ji qalibê 'erûzê xerab kiriye.<sup>50</sup>

8.

Qaim bi xwe wacîbu'l-wucûd î

Mebûd û ebîdî û ebûdî

Di misraya duyemîn de û ya atîfe hem dirêj hem jî kurt hatiye xwendin.

9.

Îhdad kirin bi yekva merbût

<sup>50</sup> Siwadî, *Leyla û Mecnûn*, 13.

Hewas û eql di niv mezbût

Di misraya yekemînde di peyva “îhdad”ê bi med hatiye xwendin. Di misraya duyemîn de di peyva “hewas”ê û “mezbût”ê jî bi med hatiye xwendin.

10.

Karê te ye zahîr û nihanî

Ruh anî û pê kesî nizanî

Di misraya duyemîn de di peyva “kesî” de di hêceya ke’yê de îmale hatiye bikaranin.

Wek encam em karin bêjin ku di likolînê de me tehlîla helbestan li gor ‘erûzê kir. Wextê me helbestan latînîze kir li gor ‘erûzê û li gor metoda ku me qalê kiribû kir. Me dît ku di latînîzekirinê de eger ‘erûz ne li ber çava be, gelek xeletî derdikeve holê.

## ENCAM

‘Erûz di edebiyata klasîk te cihêkî gîrîng digire. Lewra ‘erûz rîtma helbesê tîne holê. Di ‘erûzê de hêceyên dirêj û kin ji bo rîtma helbestê tê bikaranîn. Ji bo zanebûna ‘erûzê hin rê û rêbaz hene. Ji bona zanebûna helbestên klasîk lazim e kêş û rêbazên erûzê bê bikaranîn.

Helbest bi rîtm û ahangê tê nivîsandin. Di helbestên her milletî de ji bo rîtma dangan hin rê û rêbaz hene. Di helbestên Kurdî yê klasîk de ji bo rîtmê jî ‘erûz hatiye bikaranîn. ‘Erûz, di edebiyata klasîk de mijareke muhîm e. Lewra di edebiyata klasîk de helbesvanan berhemên xwe bi e’ruzê nivîsandine. Di e’ruzê de hêceyên kurt û dirêj li gor sîstemekê tê bikaranîn û rîtma dengê tîne holê.

Kêşa e’ruzê cara e’wil di edebiyata ‘Erebî de hatiye bikaranîn. ‘Erûz piştî qernê 8’an li gelek deweran hatiye bikaranîn. ‘Erûz li derdora Îranê, Efganîstanê, nava Asyayê û Hîndîstanê belav buye. Piştî ku Kurd û Faris bi hev ra Misilman bûne, kêşa ‘erûzê derbasî edebiyata Kurdî û Farisî bûye.

Di ‘erûzê de hin mijar wek qusûrên helbestvan tînin. Yek ji qusûrên helbestvan zîhaf e. Di zîhafê de qalibê kelîmeyan tê guhertin. Ji ber vê jî esl û ahenga kelîmeyan bi zîhafê xerab dibe. Îmale jî ji bo helbestvan qusûr hatiye qebûl kirin. Lê îmale qasî zîhafê nebe jî disa jî qûsûr tê qebûl kirin. Her çiqas hin nivîskaran medê di nav qusûrên helbestvan de hesibandibe jî, med ji bo helbestvan ne qusûr e. Heta terka medê qusûr tê qebûl kirin. Lewra teka medê dibe zîhaf. Zîhaf jî qûsûrek giran e.

Erûz, pîvana weznê ye ku di edebiyata klasîk de tê bikaranîn û rîtma helbestê nîşan dide. Lê wexta helbestên klasîk ên Kurdî tîn latînzekirin hin pirsgirêk derdikevên holê. Di vê xebata xwe de em hem li ser usûla tesbîtkirina erûzê û hem jî hin pirsgirêkên ku girêdayî erûzê ne rawestiyên. Vê mijarê me bi minaka berhema Siwadî ya Leyla û Mecnûn'ê nixand. Em li ser destxeta vê berhemê û latînzê wê rawestiyên.

Wek encam em karin bêjin ku di likolînê de me tehlîla helbestan li gor 'erûzê kir. Wextê me helbestan latînzê kir li gor 'erûzê û li gor metoda ku me qalê kiribû kir. Me dît ku di latînzekrinê de eger 'erûz ne li ber çava be gelek xeletî derdikevên holê.

### ÇAVKANÎ

Adak, Abdurrahman. *Destpêka Edebiyata Kurdî Ya Klasîk*. İstanbul: Weşanên Nûbiharê, 2015.

Doğan, Ahmet. *Açıklamalı ve Örnekli Aruz Bilgisi*. Ankara: Akçağ Yayınları, 2013.

Evsat, Ebu'l-Hasen Saîd b. Mes'ade el-Mucaşi'î el-Belhî el-Ahfeş el-. *Kitabu'l-'erûz*, ts.

İbn Manzûr, Cemaluddin Muhammed b. Mukerrem. *Lisanu'l-'Arab*. Beyrut: Daru'l-Kutubi'l-İlmiyye, ts.

İpekten, Haluk. *Eski Türk Edebiyatı: Nazım Şekilleri ve Aruz*. İstanbul: Dergah Yayınları, 2017.

Saraç, M. A. Yekta. *Klasik Edebiyat Bilgisi: Biçim-Ölçü-Kafiye*. İstanbul: Gökkuşbu Yayınları, 2011.

Siwadî. *Leyla û Mecnûn*. çev. M. Reşit Irgat. İstanbul: Weşanên Nûbiharê, 1999.

Topuzoğlu, Tefik Ruştu. "Halîl b. Ahmed". *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, ts. Erişim 22 Aralık 2021

Tural, Huseyin. *Arap Edebiyatında Aruz*. İstanbul: Ensar Yayınları, 2011.

Xanî, Ehmedê. *Mem û Zîn*. İstanbul: Weşanên Nûbiharê, 2009.

Xanî, Ehmedê. *Mem û Zîn*. ed. Kadri Yıldırım. İstanbul: Weşanên Avestayê.

Zahid, Zuheyr Ğazi. *Buhus fi Luġeti 'ş-Şi'r ve U'rudihi*. Beyrût: A'lamu'l-Kutub, 2001.

Zirikli, Hayruddîn ez-. *el-A'lâm Kamusu Teracime li-Eşheri'r-Rical ve'n-Nisa mine'l-'Arab ve'l-Musta'ribîn ve'l-Musteşrikîn*. Beyrût: Daru'l-İlmi'l-Malayîn, 2002.